

1.Divê ku hînbûn, bi kêmanî hînbûna destpêkî û bingehî, belaş be. Divê ku hînbûna destpêkî bivênevê be. Divê hînbûna teknîkî û pîşeyî bi firehî belav be û xwendina bilind jî divê bi wekhevîyeke giştî ji hemû kesan re, li gora şehrezayîya wan, vekirî be.

2.Divê ku hînkirin (perwerde) geşkirina giştî ya kesayetiya mirovî û xurtkirina rêza mafên mirovî û azadiyên bingehî armanc bigre. Divê ku ew hevtegihiştin, çavpoşîkirin û dostaniyê di nav hemû gelan û hemû komên nijadî an olî de geş bike, herweha divê çalakiyên Neteweyên Yekbûyî yên ji bo parastina aştîyê bi pêş xîne.

3.Dê û bav di hîlbijartina şeweya perwerdekirina zarokên xwe de xwediyê mafê pêşî ne.

#### Benda 27.

1. Herkesî maf heye ku bi serbestî beşdarî jiyana çandî ya civakê bibe, ji huneran çêjê werbigre û beşdarî pêşveçûna zanistî bike û sûdê ji berhemên wê werbigre.

2. Herkesî mafê parastina berjewendiyên razber (moral) û şênber (material) yên ku ji berhema zanistî, wêjeyî an hunerî, ya ku ew bi xwe afirandeyê wê ye, hiltên heye.

#### Benda 28.

Herkesî mafê sistemeke civakî û navneteweyî ye wisan heye, ya ku tê de maf û azadiyên di vê Danezanê de berpêşkirî bikari bin bi giştî bêne bicihanîn.

#### Benda 29.

1. Herkesî li hember civakê, ya ku tenê tê de geşbûna serbest û giştî ya kesyatiya wî gengaz e, erk hene.

Di bikaranîna maf û azadiyên xwe de heryek tenê bi wan bendan tête çarçewkirin, yên ku yasayê tenê ji bo misogerkirina nasîn û rêza maf û azadiyên kesên din û ji bo bicihanîna xwastiniyên rast ên sinciyê, pergala giştî û xweşgozariya gelemper di civakeke

1-demokratane de daniye. 2-Ev maf û azadî, ne di rewşekê de, nikarin li dijî amanc û bîrdozên Neteweyên Yekbûyî bîn bikaranîn.

#### Benda 30.

Tu temneke vê Danezanê nikare bête şirovekirin wekî ku mafekî dide dewletekê, komekê an kesekî ku, bi mebesta têkdana maf û azadiyên ku tê de hatine berpêşkirin, beşdarî çalakiyekê bibe an kirinekê bike.

(\* ) Wergerandina **Dr. Kamiran Bêkes.**

**Têbînî:** Di wergerandinê de metnên Îngilîzî, Almanî, Sirbî, Hirvatî û Erebi hatine bikaranîn

#### Cejna....

zimên bikin, gotarên hêja, helbestên şêrîn û ciwan, romanên bedew, şanoyên nirxdar.. û hemî cûreyên toreyê pê binivîsin...Bila keç û lawên me zimanê xwe ji yên netewên dîtir kêmtir nebînin û ji kurdûna xwe şerm nekin. Ji ber ku li gor nirxandina rojhilatnasên payebilind ên mîna gorbuhuşt **Lazarêv**, ziman û folklorê gelê me, ji ziman û folklorên herî dewlemend ên dinyayê ne.

Di nerîn û baweriyên me de, girînge hemî rêxistinên siyasî, dezgehên civaka sîvîl, navend û komelên mafên mirov û hemû rewşenbîrên Kurdan, piştgiriye bidin çanda nûjen, çanda rêzgirtin û parastina mafên mirov, çanda aştî, çanda hezkirin û jihevhezkirinê. Herwisa pêwîste em ramanên diyalog û jiyana hevbeş di navbera hemî netewe û olan de bidine pêş. Li hêla din, girînge em nerîn û ramanên çewtî dij mirov, ramanên rikgîriya nijadî û quretiya milî li kû dibe bila bibe, rûreş û riswa bikin. Di vê helkeftina pîroz de, hêjaye em bi bîr bînin, ku roja **04/03/2010Z** rewşenbîrê Kurd ê hêja, mamosta **Rezoyê Osê** bi gewdê xwe ji nav me bar kir. Lê, ew bi rewanê xwe yê pak herdem û gav bi me re ye, bi we re ye, û di nav gelê xwe de ye. Baweriya me ew e, ku wî mîrxasê hêja dabû ser şopa Bedirxaniyan û jiyana xwe ji bo zimên, çand û wêjeya Kurdî terxandibû. Bila cihê wî buhuşt be.

Li dawiyê, em gurzek gul û kulîlkên rengîn diyarî rewanê hîmdarê rojnameya Kurdistanê dikin, cejna we û ya hemî rewşenbîrên Kurd li seranserê cîhanê pîroz dikin!.

**Rêxisina Qamişlo ya P.Y.D K .S (YEKÎTÎ)**